


PÊŞKÊSKIRINA FIKIR Û PROJeya
KOMBÛNA CIWANÊN TÊKOSER DI ASTA CÎHANÎ DE


-2023-



Naverok

- | | |
|--|-----------|
| 1. Pêşgotin | 1 |
| 2. Pênaseya Pirsgirêkê û Lêgerîna
Çareseriyê | 4 |
| 3. Pêwistiya yekîtiya ciwanan û
zindîkirina têkoşîna enternasyonalîst
di sedsala 21. de | 10 |
| 4. Em li ser kîjan bingehê dikarin werin
cem hev? Pîvan û rêgezêن hevbeş ên
têkoşînê lazime çi bin? | 14 |
| 5. Encam | 16 |

1



Pêşgotin

YouthWritingHistory însiyatîfek e ku ji ciwanên têkoşer ên welatên cuda cuda pêktê. Em dixwazin di bin vî banî de îsal konferansekê navnetewî ya ciwanan kombikin, da ku em mîna ciwanên vê serdemê rewşa xwe, pirsgirêkên xwe, lêgerînên xwe yên çareseriyê û hevparbûna têkoşîna xwe karibin nîqaşbikin û gavek girîng ber bîhêzbûn û îradebûna ciwanan ve biavêjin. Em dixwazin bi vê broşûrê xetên qalind yên fikira xwe û projeya xwe ji bo kombûna ciwanan di vê serdemê de bidin diyarkirin. Em çîma dixwazin di vê demê de konferansekê bi vî rengî lidarbixin? Pêwistiya hatina cem hev a ciwanan di asta navnetewî û cîhanî de çî ye, çawa ye û çîma heyeye?


Ciwan di civakê de xwedî bandorekê diyarker in, lê li gorî bandorbûna xwe nayêñ esas girtin û li gorî vê ne xwedî hêz in. Çi bi awayekî biyolojîk bê destgirtin, çi jî bi awayekî civakî bê destgirtin: ciwan pêşerojê civakê ne, pêşerojê mirovatiyê ne, pêşerojê bi xwe ne. Civakêne me, welatêne me, cîhana me ber bi riyekê çawa ve biçin di encam de di destê ciwanan, yanî di destê me de ye, lê pergala heyî vê baweriyê, vê derfetê nade ciwanan. Pergala heyî pergalekê jerontokratîk

e, yanî pergalekê ku ji aliyê kalan bi hişmendiyekê kalbûyî ve tê birêvebirin. Modernîteya îro xwe çiqasa pêşketî, afrîner û zindî nîşan bike jî, lê li pişt vê sîmulasyonê rûyê pergalekê kalbûyî heye, rûyê pergalekê ku li ser pişta xwîn û xwêdana mirovatiya bindest û karker xwe têrdike û dide berdewamkirin, rûyê pergalekê emrê wê qediyaye heye. Hêzên desthilatdar li ser esasî bikaranîna hêza ciwanan desthilatdariya xwe avadikin û ji ber vê yekê her dixwazin ciwanan li gorî berjewendiyêن xwe beralî bikin, ji siyasetê dûrbihêlin, bê îrade bihêlin, mîna asker ji bo xwe bidin şixulandin, afrînerî, légerîn û enerjiya ciwanan kanalizeyî xizmeta xwe bikin. Pergala kapîtalîst her ku diçe zêdetir hewildide nifşen ciwanan biafirîne ku tenê şexsê xwe bifikirin, tenê pêşeroja xwe ya ferdî bifikirin û bi vî awayî hêza serhildêr û civakî, her wiha légerîna alternatifan a ciwanan lewaz bike. Bi vî awayî dixwaze berdewamiya xwe mîsoger bike. Berdewamiya pergala kapîtalîst tê çi wate em baş dizanin. Wêneya hegemonya cîhanî ya pergala modernîteya kapîtalîst çi ye? Şer, wêrankarî û talan e. Hilweşandina xweza ye. Kuştina jinan û qirkirina çandan e. Îqtîdara pere, diz û mafya ye. Feqîrbûn, birçîbûn û nexweşî ye. Jihevketina civakê ye. Berdewamiya vê pergalê bi awayekî otomatîk tê wateya berdewamî û mezînbûna vê wêneyê.

Pergala kapîtalîst piştî hilweşandina Yekitiya Sovyetê serkeftina xwe beramberî mirovatî û dîrokê ilan kiribû û teorîsyenên wê vê yekê mîna 'dawiya dîrokê' jî pênasekiribûn. Bi vî awayî xwestibûn xewn û xeyalên mirovatiyê ji bo cîhanekê cuda, ji bo jiyanekê azad û bi rûmet, ji bo jiyanekê derveyî wêrankariya kapîtalîzmê defin bikin. Pergala kapîtalîst hewilda xwe bê alternatif bide

nîşandan, lê di van zêdetirî 30 salên dawî de îspat buye ku ne dawiya dîrokê hatiye, ne jîxewn û xeyalên me tunebûne. Çawa ku di 1968'an de ciwan li seranserî cîhanê bang dikirin, 'Cîhanekê din mumkin e', em îro jî bi zelalî, bi dengek bilind, bi bîr û bawerî dibêjin: Kapîtalîzm ne bê alternatif e! Cîhanekê din mumkin e! Di roja me ya îro de li çar aliyên cîhanê li ser vî esasî însan di nava lêgerînê û têkoşînê de ne. Di serî de jin, ciwan, kedkar û karker li gellek deverên cîhanê nerazîbûna xwe beramberî sîstema heyî bi zelalî tînin ser ziman. Da ku em karibin bersiv ji pirsgirêkên mezin ên roja me ya îro re bibînin, da ku em karibin li beramberî vê sîstemê ku di asta navnetewî û cîhanî de xwe sazkiriye bisekinin, ji bo parvekirina zanebûn û tecrubeyên xwe bi hevdûre û hêzdayîna hev lazime em wekî ciwanan têkoşer ên vê serdemê werin cem hev. Em hev zêdetir nasbikin, em nîqaşbikin û em xwe bi hev re birêexistinbikin. Pirsgirêkên esasî yên mirovatiyê di roja me ya îro de çi ne, riyên çareseriyê çi ne, rewşa têkoşînên me yên li dij-pergalê çawa ye, pirsgirêkên taybet ên ciwanan di roja me ya îro de çi ne, pirsgirêkên me li kûderê dişibin hevdu, em çawa dikarin piştgirî bidin hev, erk û berpirsyartiyêن ciwanan di vê demê de çi ne û çawa dikarin xwe bi hev re rêxistinbikin? Wekî vê em dixwazin gellek mijaran nîqaşbikin. Ev brosûr jî di vê çarçoveyê de destpêkirinek e û di heman demê de jî bangawaziyek e.

2



Pênaseyî Pirsgirêkê û Lêgerîna Çareseriyê

Kes nikare îddia bike ev dinya bê pirsgirêke û gulûgûlîstan e. Gellek pirsgirêkên mirovahiyê hene. Lewma pêwîstî heye ku em karibin li ser bingehek hevbeş a têgihiştina pirsgirêkê werin cem hev da ku bersivêن çareseriyê jî bi hev re nîqaşbikin. Bêguman her parzemînek, her wlatek, her herêmek, her mileték û civakek xwedî rastiyekê xweser ê dîrokî-civakî, çandî û ekonomî ye. Bi vê rastiyê ve girêdayî jî pirsgirêkên xweser ên her parzemîn, welat, herêm, milet, û civakê hene. Di heman demê de li seranserî cîhanê pirsgirêk û nakokiyêن hevpar hene: Koletî li herderê koletî ye, zilamsalarî li herderê zilamsalarî ye, nijadperestî li herderê nijadperestî ye, kedxwarî li herderê kedxwarî ye, desthilatdarî û bindestî li herderê desthilatdarî û bindestî ne, birçîbûn û feqirtî li herderê birçîbûn û feqirtî ne, şer li herderê şer e. Li beramberî wê azadî, wekhevi, edalet, mafê jiyanê û rûmeta mirov nirxên gerdûnî ne. Ev nirx aydî herkesî ne, tenê aydî cihek, mileték yan jî çînekê nîn e. Rûyê wê li welatêne me xwe çawa nîşan bide jî, wekî ciwanêن têkoşer em ketine rê ji ber qebulnekirina neheqî, bêedaletî û newekhevi ye.

Desthilatdarî dibe ku şekilê wê, rê û rîbazê wê, tarzê wê, uslubê wê cih bi cih ji hev cuda bin, lê di bingeh de pirsgirêk yek e: Desthilatdari ye û şêwazê wê yê hegemon di roja me ya îro de: Pergala kapitalîst e. Desthilatdarî bi riya kolekirina jinê, bi riya pêşxistina pergala zilamsalarî û hismendiyekê zayendperest re avabûye. Di bingeha hemû pirsgirêkên civakî de pirsgirêka azadiya jinê heye. Kapitalîzm jî di vê çarçoveyê de li ser kûrkirina pergala zilamsalar û zayendperest avabûye. Wekî din bi giştî em dikarin bibêjin ku kapitalîzm li ser desthilatdariya pere û hegemonya îdeolojîk xwe avadike û bi riya sîstemên siyasi yêñ cur bi cur wekî parlamentarîzm, milîtarîzm û faşîzm xwe dide meşandin. Di bingeha wê de qezenga zêde, endustriyalîzm û netew-dewlet heye, her wiha ji aliyê çandî-civakî ve hegemonya tarzê jiyana lîberal, yanî îdeolojiya lîberalîzmê heye. Bilindbûna çîna burjuva û péra sazîbûna pergala kapitalîst bêyî qirkirina gelên xwecihî yêñ Amerîka, bêyî tasfiyekirina tevgerên heretîk û serhildanêñ gundîyan li Ewrupa, bêyî qetliama jin-caduyan, bêyî mêtîngîh û dagirkirina Afîka, Asya û Başurê-Amerîka û bêyî bazırganiya koleyan ji Afîka ber bi Amerîka ve naye fikrandin û nikare were fikrandin jî. Ew hemû bi hevre girêdayî ne, bi vî rengî kapitalîzm avabûye û bi heman mantiqê jî îro hebûna xwe li ser mirovatîyê ferz dike. Kapitalîzm şerê cîhanê 1. û 2. bi xwe re anî, gelan di qirkirinê re derbaskirin û her ci hewldanekê şoreşgerî hebû bi darê zorê yan bi helandin û bisaftinê ve tasfiye kirin. Îro jî şerekî mezîn di asta cîhanê de rû dide û hedefa hêzîn hegemon ên kapitalîst jê ev e ku bi ji nû ve dîzaynkirina xwe û civakê re bikaribin temenê xwe dirêj bikin û xwe ji nava qeyrana kûr a hilweşînê xilas bikin. Ji bo

berjewendiyêن xwe, bi rêbazêن nerm û hişk, bi rêbazêن helandin, bîşaftin, qirkirina çandî û fizikî, bi sîstemekê şerê taybet û şerê psîkolojîk a ku di dîrokê de nehate dîtin, bi rê û rêbazêن siyasi, leşkerî, idolojîk, psîkolojîk, aborî û hwd. ev şer li dijî gelan tê pêşxistin. Yanî em dive fêmbikin ku cih ferq nake, em di nava pêvajoyekî şer ê vê sîstemê de jiyan dikin. Bêguman di vê şerê de wê dilê me ji bo mirovahiyê lêbide û ji bo rûmet û keramtea xwe em ê li dijî pergalê bin.

Kapîtalîzm tê wateya qirkirinê, tê wateya talan û dizî ye, tê wateya hilweşandina xwezayê û jihevketina civakê. Kapîtalîzm tê wateya ji cewhera xwe dûrketine, çanda xwe windakirin û dîroka xwe jibîrkirine. Kapîtalîzm tê wateya kuştina jinan, faşîzm û bêhişkirina ciwanan. Kapîtalîzm ji bo civak, jin û ciwanan tê wateya mirin e. Ev pergalekê tevahî antî-civakî ye.

Di çarçoveya pergala hegemonîk a modernîteya kapîtalîst de weke ciwan dive em di serî de pirsgirêkên ku yekser aydî ciwanan hene nîqaş bikin. Bêguman hemû pirsgirêkên civakê aydî ciwana ne ji, lê têkildarî ciwanan hin pirsgirêkên esasî li berçav in û bi vî awayî xwe li ser me ferz dikin:

1. Ciwan û tarzê jiyana liberal

- a. Ferdperestî û ezezitî
- b. Bandora medya dijîtal li ser jiyana civakî a ciwanan
- c. Bandora endustrîbûna çand û hûnerê
- d. Bandora endustrîbûna spor
- e. Bandora endustrîbûna seks

2. Ciwan û zayendperestî

- a. Şîddeta li ser jinê
- b. Bandora hûnerê, medyayê, malbat, perwerde, hwd.

3. Ciwan û pirsgirêka ekolojî

- a. Xapandina fikir û projeyên bi nave 'kapîtalîzma kesk'
- b. Bandora nêrînênen reformist di tevgerênen ekolojîk de

4. Ciwan û faşizm/milîtarîzm

- a. Bandora ferasetên nijadperest û netewperest li ser ciwanan
- b. Bikaranîna ciwanan di şerên desthilatdaran de
- c. Dagirkerî û mêtîngerî
- d. Çetecitî û madeyên hişbir

5. Ciwan û perwerde

- a. Malbat û saziyên dewletê weke dibistan û zanîngehan
- b. Dibistan û zanîngehênen taybet

6. Ciwan û aborî

- a. Bêkarî, kedxwarî û jiyana karkerên ciwan
- b. Ciwan weke hêza fizikî ya kar dîtin

7. Ciwan û koçberiyê

- a. Pergalekê ku evqasa tê nefretkirin çawa di heman demê de dikare evqas ciwanan ji koka wan qutbike û ber bi metropolan ve bikşîne?
- b. Çareseriya koçberiyê eceba vekirina sînoran yan jî guhertina pergalê ye? Koçberî li welatênu ku ciwan jê direvin bi xwe re ci pirsgirêkan tine?

8. Jinêن Ciwan

- a. Pirsgirêkên civakî yên jinêن ciwan
- b. Êrîşêن pergala kapîtalîst li ser jinêن ciwan

Li ser van esasan ji bo me wekî ciwan yek ji pirsgirêkên sereke rast naskirina nasnameya ciwantî ye û bi wê yekê ve girêdayî ciwanên civaka xwe ji bin bandora nêrînê desthilatdariyê û tarzê jiyana kapîtalîzmê derixtine. Heger em bixwazin têkoşînekê encamgir li hemberî kapîtalîzmê bimeşînin ev yek erkekî me yê herî temeli ye.


Pirsgirêk û nakokî hertim bi xwe re jî lêgerînê çareseriyê tînin. Di roja me ya îro de li seranserî dînyayê diyar dibe ku di serî de jin û ciwan, mirovahî ne bê lêgerîn e. Krîz û qeyranê civakî, siyasî û aborî li çar aliyêن cîhanê mezin dibin. Germhbûna av-hewayê bi xwe re guhertinêñ dijwar ên klîma, her wiha zêdebûna felaketêñ xwezayî anî. Şer li gelek welatan zêde dibe. Li ser van esasan ji Latin Amerîka heta Asya, ji Bakurê Afrîka heta Bakurê Amerîka, ji Başurê Afrîka heta Rojhilata Navîn û Ewrupa însan radibin serhildanê, nerazîbûna xwe tînin zîman, guhertinêñ berbiçav dixwazin û li ser van esasan xwe birêxistin dikin. Jin li hemberî pergalekê tecawiskar û kujer ê zilamê serdest li ser piyan e. Ciwan li dijî wêrankirina xwezayê di nava liv û tevgerê de ne. Gelêñ bindest ji bo çarenûsa xwe di nava çalakiyan de ne.

Piştî hilweşandina Yekitiya Sovyetê û bloka Hevpeymana Warşaw hêz û tevgerên dij-pergalê li piraniya deverên cîhanê pêra girêdayî ketine nava krîzekê kûr a nasname, hêvî û perspektifê. Ruxmê ku gellek ji wan hêz û tevgeran bi xwe jî xwedî rexne li beramberî sîistema sosyalîzma pêkhatî bûn

nikaribûn xwe ji bandora têkçûyîna wê xilas bikin, nikaribûn têkçûyîna wê bikin sedemekî ji nûve zindîkirina hêvî û têkoşînên azadiyê. Dibe ku hin tevger tam di vê demê de zindîbûn û mezînbûn jiyankiribin, mîna tevgera Zapatîstas yan jî Tevgera Azadiya Kurdistanê, lê bi gelempêrî bandorbûnek bi vî awayî hebû. Pergala kapîtalîst û pêşengêñ wê yên teorîk-îdeolojîk serkeftina xwe îlankirin û vê yekê mîna 'dawiya dîrokê' pênhase kirin. Di asta navnetewî de bersiva hêzên dij-pergalê têrker nebû û ji ber vê yekê li gellek deveran her ku çû marjînal bûn. Em îro nikarin bibêjin ku bandora têkçûyîna sosyalîzma pêkhatî nemaye, lê em dikarin bibêjin ku ev yek ji bo me divê êdî nebe asteng beramberî pêşxistina têkoşînekê ciddî civakî ji bo pêşerojekê azad û jiyanekê bi rûmet. Dema şoreşan, dema hêviyê, dema guhertinên mezin ên civakî derbasnebûye, îro tam wexta wê ye. Em ji bo pirsgirêkên heyî ku me hejmartin bi hev re çareseriyan bibînin. Em têkoşîna xwe li ser vî esasî hem di gundê xwe de, di bajarê xwe de, li ser asta herêm û welatêñ xwe de pêşbixînin, hem jî em li ser asta navnetewî û global de bi hev re bibin hêz û quweta bidestxistina qedera mirovahiyê.

Di konferansa xwe de em dixwazin van pirsgirêkan û riyêñ çareseriyê bi hev re gotübêj bikin. Ji bo vê em ê hem derfeta guftûgoyê di çarçoveya xwesertiya parzemînan de avabikin, hem jî hemû bi hev re nîqaşbikin.

3



Pêwistiya yekîtiya ciwanan û zindîkirina têkoşîna internasyonalîst di sedsala 21. de

Ciwantî tenê nasnameyekî biyolojîk nîne, lê ji vê hîn zêdetir nasnameyekî civakî, her wiha nasnameyekî psîkolojîk-ruhî ifade dike. Çawa ku di aliyê biyolojîk-fizikî de însan di ciwantiya xwe de herî zêde bi hêz e, zindî ye û xwedî enerji ye, jialiyê psîkolojîk-ruhî ve ji însan dema ku ciwan be herî zêde afrîner e, çalak e û dînamîk e. Di vê maneyê de ciwantî hezkirina jiyanê, hêvî, irade, guhertin û tevgerbûnê ifade dike. Di vê maneyê de civakekî ku ciwan be zindî ye, li ser xwe ye û xwedî pêşeroj e, lê civakek ku taybetmendiyên xwe yên ciwantî ji dest dabe, ev civak ber bi xitimandinê, zîhabûnê û ji hev belavbûnê ve diçe. Çawa ku mirov tenê hebûnekê biyolojîk nîne, lê hebûnekê civakî ye û ji ber vê bê hebûna civakê nayê fikrandin, civak ji bê ciwantî nayê fikrandin. Li ser vî esasî rêxistinbûn û yekîtiya ciwanan yek ji şertîn esasî yên parastina civakê, xwezayê û herikandina jiyanê ye.

Di van 150 salêن dawiyê de gellek hewildan û ceribandinêñ cuda cuda çêbûn da ku karker, kedkar, jin û gelêñ bindest

îtifaqêن xwe yên têkoşinê di asta navnetewî de avabikin û xwişkatî/biratiya gelan ne tenê di gotinê de bihêlin lê pratize bikin. Ji Enternasyonala yekem, duyem û sêyem bigire heta Konferansa Sê-Parzemînan (Tricontinental), ji Enternasyonala Jinêن Karker bigire heta federasyonên anarşîstan ên navnetewî, ji avakirina Yekitiya Sovyetê mîna projeyekî biratiya gelan bigire heta taburên enternasyonal, berxwedana li hemberî faşîzmê û piştgiriya navnetewî ji bo tevgerên rizgariya netewî û têkoşinên dij-mêtingeriyê, bi hezaran mînakên piçuk û mezin hene ku li vir hemû nikarin werin ser ziman. Her yek ji wana mîrasek li pey xwe hiştin, nîrx avakirin, tecrubeyêngirîng û dersên manedar dane me. Bi milyonan di oxira van têkoşinan de cane xwe feda kîrin. Ev broşûr bi xwe ne cihê wê ye ku em wana niha bi hûrgilî binirxînin, lê ya ku derdikeve holê çi ye? Li ruxmê ku di tevahî têkoşin û şerên azadiyê de ciwan hertim rolekê serekê lîstin tu carî nasnameya ciwantiyê di van rîexistinbûnan de esas nehate girtin. Ceribandina Enternasyonala Ciwanan di salên 1920'an de ji bi tenê demkurt karibû xwesertiya xwe biparasta, lê piştî vê ketibû bin venêrîna Enternasyonala Sêyemîn û mîna Enternasyonala Jinêن Karker piştî çend salan hat feshkirin.


Piştî hilweşandina Yekitiya Sovyetê şûnve ji hin tevger derketin pêş ku karakterê xwe yê bingehîn enternasyonal bûn. Bi taybetî tevgera dij-globalîzmê xwe di vê çarçoveyê de birêexistinkir û ji salên 90'an heta 2000'an karibû girseyên mezin seferber bike. Di vê çarçoveyê de kombûna Sosyalforum Cîhanê ji ezmûnekê girîng e. Lê di encam de bandora wê iro sînordar bûye û di halê xwe yê heyî de tam nikare bibe bersiv ji pêwistîyêng demê re. Li kêleka wê di roja

me ya îro de gellek îtifaqêن cur bi cur di asta navnetewî de hene, lê di bandora xwe ya ji nû ve zîndîkirina ruhê enternasyonalîzmê di têkoşîna li dijî modernîteya kapîtalîst de teng dimînin. Herî dawî bi taybetî tevgerên jinêن têkoşer û her wiha tevgerên ekolojîk her yek ji hêla xwe ve derketinêن berbiçav ên têkoşînekê hevpar a enternasyonalîst avêtin. Pêwistî bi kombûnekê nû ya ciwanêن têkoşer jî heye ku bi ruhê ciwantiyê, bi awayekî çalak, radîkal, bêtirs, dinamîk û rêxistinkirî pêşengtî jitêkoşîna global hemberî bindestî, zilamsalarî, nîjadperestî, kedxwarî û talana xwezayê re bike. Da ku têkoşînekê encamgir li hemberî kapîtalîzm pêşbîkeve, da ku xwe ji bandorêن ferasetêن liberal û reformist rizgar bike û bi rastî derveyî pergalê karibe alternatifekê azad avabike cesaret lazime. Yê ku xwedî vê cesaret in, xwedî vê potensiyeł û hêzê ne jî di serî de ciwan in. Yekitiya ciwanan di vê çarçoveyê de pêwist dike: ciwanêن ku di ferqa nasnameya xwe de ne, ciwanêن ku bi cesaret têkoşîna cins û çînî dikarin bimeşînin, ciwanêن ku dikarin pêşerojekê azad xeyal bikin û di heman demê de ji koka xwe qut nebin, ciwanêن ku dikarin bandora fikir û hişmendiyêن zordest, zayendperest û nîjadperest ji ser xwe biavêjin û li şûna vê jiyanekê komînal û hevgirtî avabikin, ciwanêن ku bi hezkirina gel û dîroka xwe dikarin xerîbketina kesayet ji cewhera xwe derbasbikin, ciwanêن ku li çar aliyêن cîhanê hev hîsbikin, pişta hev bigirin, ferdperestiya lîberalîzmê vala derxînin û pêşengtiya civakbûnekê azad û bi rûmet bikin.

Konferansa me, mîna kombûnekê yekemîn, dikare di vê çarçoveyê de bibe gavek girîng. Heger em karibin li ser van esasan hevgirtina xwe ya ciwanan gav bi gav pêşbixînin, vê demê em ê di vê sedsalê de bikaribin ruhê tabûrêن

internasyonal û serhildanêن 68'an carekê din zindî bikin, cinawirê kapîtalîzmê hilweşînin û pêşxistina jiyan û cîhanekê din, azad û bi rûmet mîsoger bikin.

4




Em li ser kîjan bingehê dikarin werin cem hev? Pîvan û rêgezên hevbes̄ ên têkoşînê lazime ci bin?

Hatina me ya cem hev dê li ser van bingehênu ku me anîn ser ziman çêbe. Dibe ku fîkrênu me yên ji hev cuda hebin, dibe jî ku tarz û şêwazên me yên rêexistinbûnê ji hev cuda bin. Çandênu me û zimanênu me jixwe ji hev cuda ne, her wiha em hemû ji welatênu cuda tênu, her yek xwedî dîrok û rastiyekê xwe ye. Hin ji me ji rêexistin û tevgerên mezin tênu, hin ji me jî ji rêexistinbûnen piçuk tênu. Em vana wekî dewlemendiyêñ itîfaqa xwe fêmdikin û li ser esasî van ferq û cudahiyan em dixwazin bi hev re nîqaş bikin, ji hev fêrbibin û hêza xwe bikin yek. Derveyî vê, li kêleka ferq û cudahiyan me ji gellek hevbesî hene. Hevbesiya esasî û bingeha hatina cem hev ji bo me dijayetiya pergala kapitalîzmê ye, ango di mirovbûnê de îsrarkirine. Em li welatênu xwe her yek bi rengekî û şiklekî di bin destê vê pergala de dijîn, êşa wê dikşînin û ji ber vê yekê dixwazin xwe jê rizgar bikin. Lêgerînekê çareseriyê di hundirê çarçoveya pergala kapitalîst de, di bin bandora fikir û hişmendiyêñ zilamsalar, zayendperest û nîjadperest de em

nikarin qebul bikin. Li ser vî esasî jî pîvan û rêgezêن me yên hevpar divê zelal bin:

- Rêzgirtin beramberî şêwaz û rêbazêن cuda yên rêexistinbûn û têkoşînkirinê.
- Xwişkatî û biratiya gelan mîna nirxekê esasî bilindkirin û parastin.
- Dijayetiya desthilatdarî, kapîtalîzm û zilamsalariyê û bi wê ve girêdayî dijayetiya zayendperestî û nîjadperestiyê.
- Redkirina hemû awayên dagirkerî û mêtîngeriyê di cîhanê de û li ser vî esasî parastina mafê rewa yê xwe-parastinê ya her milet û civakekî.
- Bi nirxên mirovahî yên azadî, edalet û wekheviyê re girêdanbûn.
- Li ser bingeha dijayetiya kapîtalîzmê bûyîna xwedî helwest û biryardariyekê antî-faşîst û antî-emperyalîst.

5



Encam


Pêwistiya vê cîhanê û vê mirovahiyê bi ciwantiyekê xwedî îrade, xwedî hêz, rêexistinkirî, ji xwe bawer û radîkal heye. Pirsgirêkên heyî di nava pergala kapîtalîst de nayêن çareserkirin, lêgerînekê çareseriyê di hundirê qefesa kapîtalîzmê de bê sûd e, bê feyde ye. Kapîtalîzm mirovahiyê aniyê ber kendal e, xilasbûn encex di hilweşandina kapîtalîzmê û li şûna wê avakirina jiyan û cîhanekê din de pêkane. Ji ber vê yekê encam ev e ku divê em di zûtirîn demê de werin cem hev. Pêwistî bi yekbûna ruh û hêza ciwanêن têkoşer ên cîhanê heye. Di sala 1848'an de Manîfestoya Komunist ku bandor li milyonan însan heta roja me ya iro kiriye bi banga 'Karkerêñ tevahî welatan bibin yek!' bi dawî bû. Em li ser vê mîrasê niha bang dikan: '**Ciwanêن cîhanê bibin yek û vê cîhanê biguherînin!**'

Me di serî de jî gotibû ku 'zanyarêñ' kapîtalîzmê bi me xwastibûn bidin bawerkirin qaşo dîrok bi dawî bûye, lê em baş dizanin: Dîrok bi awayekî berdewam diherike û yê ku vê dîrokê dînîvisîne jî em bi xwe ne. Qedera me di destê me de ye, em ê pêşeroja xwe bi xwe diyarbikin û em ê pêşerojekê tarî di nava pençêya kapîtalîzmê de tu carî qebul nekin.

Çareya me rêexistinbûn e, têkoşîn e û jiyanazad avakirin e. Li ser vî esasî em li hêviya konferansekê yekemîn ê serkeftî ne û silavêni xwe ji tevahî ciwanêni têkoşer re dişînin.

Insyatîfa „Youth Writing History“

Tîrmeh 2023



**"PÊŞÎLÊGIRTINA CIWANÊN KU BER
BI AZADIYÊ VA DIMEŞİN ZOR E."**

- ABDULLAH ÖCALAN